KAMRAN BEDIR-KHAN

# PERÇEYÊN BIJARTE

PARIS

1971

LP.KL.126

lp·KL·126·

INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHEQUE ·

Kamran Bedir - Xan

# Perçeyên Bijarte

Parîs

I 9 7 I

## Têxistiyên Nvîsdarê .

Nav . Rûpel .


Çawan divê em bixebitin di warê zmên de . I

Leylana Rastiyê . 2

Pirçemek û Silêman . 4

Dildiziya Gulekê . 5

Mêrê min di şerî de ye . 6

Welat , Welatînî û A l . 7

Ey Reqîb . 9

Margî Pêşmerge . I0

Li ber tevna mehfûrê . II

Du Egîd . I6

Du Dengbêj . I7

Rasthatineke ecêb . I9

Di dora lihevxistina zmanan de . 20

Strana xebatê .

Rovî û Toz Beg . 25

Nivêja miriyan . 3I

Eyloyê pîr . 32

# Perçeyên Bijarte .

Çawan divê em bixebitin di warê zmên de .

Ji Hawarê : Hejmar I .

Hawar dengê zanînê ye . Zanîn xwe nasîn e . Xwe nasîn ji me re reya xebat , felat û xweşiyê vedike . Her kesê ko xwe nas dike , dikare xwe bide nas kirin. Hawara me berî her tiştî heyîna zmanê me dê bide nas kirin . Lewma ko zman şerta heyînê ya pêşîn e . Hawar jû pêve bi her tiştê ko kurdanî û kurdîtî pê bendewar e , dê mijûl bibe .

Awayê xebatê : Karekî ko bikare biçe serî , divêt jê re pronivîsek an go programek bête çêkirin .

Me proniv îsa xwe ser bingehên jêrîn lê kiriye .

Belavkirina elfabeya kurdî di nav kurdan de û hîn kirina wê . Senifandina zmanazîna kurdî û hîn bi hîn di Komelê de belav kirin û pêşdetir di şiklê kitêbê de derêxistin .

Sehîtiya zarên kurdî û berhevdanîna wan . Sehîtî ser mirovatiya zmanê kurdî digel zmanên din ên arî ango Hindû - Ewrupayî . Sehîtî ser bingehên zmanê kurdî, ser dîrok , ango ser tarîx û awayê pêşveketina wî .

Berhevkirina methelok , mamik , çîrok , çirçîrok , stran û lavijên kurdî û birêve belav kirina wan . Senifandin û belavkirina wan .

Senifandin û belavkirina dîwanên kurdî . Bi van ve jînenigariyên şair û mirovên bijarte jî dê bên belav kirin .

Sehîtî ser reqs û qeydeyên stranên kurdî .

Sehîtî ser her texlît rêzikên kurdî û Kurdistanê yên zemanên borî û yên îro û senifandina wan . Sehîtî ser hatinên Kurdistanê û destxet , pîş û sinhetên kurdî .

Sehîtî ser tevayiya dîrok û erdnigariya Kurdistanê û ser dîroka eşîran ya berê , paşî , di wextê Mîr Şeref de û heta îro .

Celadet Bedir - Xan

---

## Leylana Rastiyê

Nîvê şevê ye . Ezman bê stêr e . Bayekî sar û dijwar tê .
Li ser rêke asê û xwehr bi hezaran û bi sed hezaran kurd , pîr û ciwan , jin û zaro , sax û nesax diçin .
Di dora wan de gund û bajar xirbe ne . Ji bixêriyan dû dernakeve , reyîn se na yin .
Rez û dehl , zevî û bexçe şewitandî ne . Ne meywe hene ne jî gulçîçekên rengîn û bihndar .
Mazî , deyndar , rpelî , guhîj , spîndar , bî , bî - şeng , darên berû hişk in , hatine şewitandin û ew mîna kêlên tirban û goristanan mane . Wek kêlên miriyen , şehîdên Kurdistanê mane . Keriyên pez û garanên dewaran xuya na bin . Çarmedor kavil e , kavilekî tarî .
Ji dûr ve , heroj , roj dibiriqe , bajarên mezin û gundên ava xuya dibin .
Ji dûr ve , gelek dûr , di buharê de , kulîlk di - bişkivin , deşt û mêrg , germiyan û zozan bi giya û bi heşînatiyan , heşînatiyên pirereng , xemilandî ne . Buhuşta bihn û reng deriyê xwe vedike .
Lê , di vê rê de , di vî geliyî de ronahî nî ne , tav nî ne , roj dernakeve , ne rojhelat û ne jî rojava . Gelî tarî ye .
Birîndar ji êşên birînên xwe , jin û zaro ji birçîtî û tihniyê dinalin û digirîn . Zaroyên berşîr jî bir- çî ne , memikên dayikên wan ziwa ne . Kes kesî na bîne . Gelek caran , di tariyê de, rêwingî reya xwe win- da dikin .
Lê , ev koma kurdî bi zehmet , bi cefa , bi xwîn û birîn pêş ve diçe .

Bi şûn xwe ve , di rêça xwe de , bi sedan dilsotî , canşewitî û brîndar û miriyan dihêle . Bê tirb û bê kêl wan berdide .

Wisan , bisalan ve , ev kom birêveçû , di tariya şevê de , di badevê de , di sariya zivistanê de pêş ve çû .

Serborî û serhatiya xwe bi mirî û brîndarên xwe li ser reya xwe nivîsand û çap kir .

Ev kom şevekê giha zozanekî spehî , li pêşberê çiyakî bilind û mezin .

Gelek sal hebûn ko vê komê ronahî , germî û şabûnî ne dîti bû .

Ji nişka ve , di pêşberê wê de ronahiyeke zelal çirisî. Reya wê ya asê rast , sivik û xweş bû , ne kevir ma bû ne jî stirî .

Çarmedor , hêdî hêdî xuya bû . Ji her girî , ji her palên çiyan . Ji her deşt , ji her serê kaniyekê gundine ava û xemilandî xuya bûn . Mêrg û çîmen , rez û bexçe bi sosin û rêhanan , bi nêrgiz û benefş , bi gulnexwîn û belalîzkan teyisîn .

Brîndar li brînên xwe dinêrin , dibînin ko wan goşt girtiye ; dê li zaroyên xwe mêze dikin û dibînin ko rûyên wan eydî ter û taze ne , ne zer in û ne bi hêstir in , hinarikên rûyên wan wek gul û gulnexwînan sor in , dê li memikên xwe dinêrin û dibînin ko tejî şîr bûne. Rihspî û pîrejin xwe ciwan dihesin , dibînin ko ji dilên xwe re xort bûne . Ji nişûvên çiyan û zozanan pez dadikevin jêr , berx û karik di çêreke boş û bilind de xwe hildavêjin û dileyizin . Xelkên komê dikenin û distirin , hemî bi govend û saz in . Hemî ji hev û du dipirsin :

" Ma ew nalîn û girîn bi kû ve çû ? "

Çi qewimiye ko çarmedora me, ji nişka ve, wisan ava û xweş , serbest û aza , dewlemend û rengîn bû ?

Ma em ketine buhuştê ?

Rihspiyek û pîrejinek bi kopalên xwe serê çiyayî nîşa komê kir . Komê çavên xweli wî çiyayî zivirand û hûr mêze kir .
Di serê çiyayî de , xortekî bi bejn û bal , xortekî zexm û nêr , xortekî çeleng û jêhatî , xortekî bi goşt û gewde , xortekî delal û spehî çavên xwe digemirîne ûvekêşa tîne xwe .
Bi derbekê , ji komê dengekî bilind û qîreke şa -bûniyê rabû .
Komê ji rihspî û pîrejinê pirs kir : " Ez niho dibînim û seh dikim ko ronahiya min ne ji rojê ye lêbelê ji çavên wî xortî tê ! Ma çi qewimiye ? "
Ji dixweşî[1] du hêstirên germ bi ser rûyê pîrejinê de tên , ew ji nû ve wî xortî nîşa komê dide û bi dengê diá û zariyê dibêje :

Kurdistan ji xew rabû !

---

## Pirçemek û Silêman

Dibêjin , gava Silêman pêxember Belkîs ji xwe re anî bû , Belkîs jê xwest ko ji pûrta teyran jê re nivîneké çêke . Silêman pêxember ferman da hemî teyran û got : " Divê hon xwe birûçikînin , da ko ji bo Belkîsê nivînekê çêkin " . Hingê pirçemekê xwe ranegirt , zûka pûrta xwe rûçikand û çû . Lê teyrên mayîn ew ferman ne li rê dîtin û gotin : "Silêman pêxember , ma ne guneh e ko ji bona jina xwe me gîşkan bidî rûçikandin ? Em ê çawan zivistana xwe bê pûrt derbas kin . Ev pûrtê ha canê me ji sermayê diparêze . "
Silêman pêxember gotina wân rast dît û dev ji wan berda . Lê pirçemekê ko xwe rûçikandi bû , ji wê rojê de, şerm dike ko bi roj derkeve nav heval û hogiran , ji lew re , bi şev der tê .

Osman Sebrî

## Dildiziya Gulekê

Li ber deriyê Diyarbekrê parîzekî mezin heye . Ev bexçe bi sosin û rêhanan , bi lale û benefşan , bi her texlît gul û gulçîçeken xemilandî ye .
Her êvarê bayekî nerm û xweş , bayekî honik bi wan gulêlikan dileyize . Bihnûnî , kulîlk û bîşeng di hêlnoka bayî de xwe dihejînin . Avên zelal ji sîngên kuleteynan divizikin .
Di bin vê erdê de , di bin vê axa Kurdistanê da , di binaniya hîmên wî parîzî de kortalek heye . Kortal kortaleke terî .
Di vê kortalê de Şêx Seîd , Dr. Fuad , Extî û çel mêrên kurd veşartî ne . Ji wê kortalê deng na yê . Kortal lal e û di guhdariyê de ye . Kortal li hêviya dengê Kurdistanê ye .
Di wî parîzê de , her şev , gulek dedibe .

Rengê wê ji lêvên bûkan sortir , pelên wê bel û geş in . Ev gul gula azadî û serbestiya Kurdistanê ye . Gava destekî biyanî drêjî wê dike , pelên gulê tên yek . Ew gul guleke bi nav û deng e . Kurdên ko di şerê azadiyê de hazir bûne û hemî kurdên ko welatparêz in dildiziya wê gulê dizanin . Ew dizanin ko spehîtî , çelengî , germî û geşîneya wê gulê nîşanek ji hêviya Kurdistanê ye .
Kurd dizanin ko di nav her pelên wê gulê de hezar axînên brîndaran , hezar evdên şehîdan , bi hezaran hêstirên sêwî û jinebiyan , bi hezaran şînên welatiyan di xew de ne .
Şevekê zabitekî dijmin , bi delala xwe ve hat û ket nav wî parîzî . Bi gavina hişk û kanc pê li çîmenên nerm û bihnûniyan kir . Heşînatiyên zrav şikestin , pelên kulîl, kan ji hev ketin . Di nav bayê êvarê de nalîneke zîz û zelûl hebû . Ji ezmên stêr bê deng li wî biyanî dinehêrt .

Zabit, çengê wî di bin çengê delala xwe de, xwe da ber gulê û dest avêt gulê . Gulê dilkir xwe bigire lê wî ew çinî .

Weke gul ket nav destên wî , sînga xwe vekir , xwe geş kir . Zabit ew bihn kir , biderbekê , ket erdê û mir .

---

Mêrê min dî Şerî de ye !

Di welêt de şerekî mezin , serxwerabûnekê xurt çêdibû . Xelk hemî dixebitîn arîkariya şerkeran , şerkerên welêt dikirin .

Ji pala çiyayên bilind û bi heybet , ji deşt û zozanan dengê şerî û stranên welatî dihatin .

Di pala çiyayê Herêkolê de , di gundekî ava û xweşik de xelkê gund direqisîn . Roj hêdî , hêdî di gencîneya ronahiya xwe de vedimirî , diçû ava . Ewr di nav rengên sor û heşîn , al û kesk de dibezîn û diketin himbêzên hev . Îşev şeva daweta Zîn û Temo ye. Zîn û Temo îro deh sal in ,bi zencîra hevînê , pev re girêdayî ne . Sibe Temo here daweta welêt , daweta mêr û mêrxasan , egîdên kurd .

Sibe zû saet çar e . Blûr û zirne bi çi xortên kurd dimeşin . Temo di nav wan de ye . Temo ba delala xwe , jina xwe bi tenê şevekê maye. . Serê wî giran e , dilê wî dişewite . Ew dilê hevîna xwe ye , bendeyê eşqa xwe .

---

Şev e , şeveke tarî . Bayekî sar û xurt tê , berf û baran bi hevre dikevin . Di nav zinar û rêlan de , di daristanan de ba difîkîne , dengê wî kûvî ye . Temo tifinga xwe dide hevalê xwe , bê Zîna xwe ni kare , dev ji hevalan berdide û reya xaniyê xwe digire .

---

Ezman bi stêran tejî ye , berf û baran sekinîne , ba

daniye , , bes ji dûr ve ewrekî reş dilive .
Li deriyê Zînê didin . Zîn ji hindur dipirse . Dangê mêrê wê tê :
- Zînê , veke , ez im mêrê te , Temo !
Zîn derî vedike , li Temo dinêre , bi çavekî tehl û sar lê mêze dike û jê re dibêje :
- Mêrê min Temo , bi hevalên xwe ve , di şerî de ye û derî digire .

---

## Welat , welatînî û al

Welat erdê bav û kalikên me ye . Welat ew der eko , pêşiyên me li wê rabûne , ji bona avahiya wê , parastina wê xebitîne û li wê mirine .
Welat ew diyar e ko , em têde sekinîne û rojekê di nav axên wî de dê bêne veşartin . Xelkê welatekî , welatiyên hev in . Borî , hal û dawiya wan bi hev re girêdayî ne . Zmanê wan , girêdana wan , rabûn û rûniştina wan , her hal û lebtên wan mîna hev in .Pêşiyên wan li rex hev û du rabûn , rûniştin û mirine.
Welatî bi qenciya hev şa dibin , li ber xirabiya hev dikevin . Şîn û şahîneta wan yek in .
Xelkê welatekî brayên hev in , pismamên hev in . Her gav bi hev re , dest bi dest , ji bona xweşî , avahî , û azahiya welatê xwe dixebitin . Kar û armanca wan - yek in , Ji bona azahiya , ji bona serbestiya welatê xwe can û malên xwe didin der , xwîna xwe bêperwa dirijînin . Herê , dixebitin da ko welatê wan me keve bin destê miletên din .
Lê miletin hene ko welatê wan , bi awakî , ketiye bin destên neyar û dijminan . Wek welatê me , welatê Kurdistanê .
Ew miletên ha ji bona rizgariya , serbestiya , azadiya welatê xwe dixebitin . Xebata wan ev e ; rojekê berê ro biyaniyan ji welatê xwe derînin û mîna miletên din biserxwe

û di nav hev de bi xweşî , bi qencî û bi bextewarî bijîn .

Her kes hejî welatê xwe , hejî welatiyên xwe dike . Hejkirina welat di dilê me de hevîneke mezin û bilind e . Em pê xurt , zexm , mêr û canfeda ne . Jê re welatînî dibêjin .Welatînî di hundirê me de agirekî miqedes e . Pêta wî agirî ji me re her tiştên welêt dide hej kirin . Ji lewre , di ber çavên me de ax , deşt , dar , çiya , zozan , germiyan û kevirên welatê me ji yên welatên din spehîtir , xweştir û şîrîntir in .

Her milet xwyîyê alekê ye . Al nîşana milet û welêt e . Tevayiya heyînên miletan di ala wan de civiyaye . Al namûs , rûmet û bextê miletan e . Zaroyên her miletî ji ji bona bilindî û biqedirbûna ala xwe bê perwa xwe didin kuştin . Ala her miletî jê re bihagiran e . Di cejn û şahînetan de qesr , seray , xanî û kolan û kûçeyan pê dixemilînin , di ber wê re diborin , slavan lê dikin , wê maç dikin , datînin ser serê xwe . Alên miletên biserxwe di ser kelat û bajarên wan re pêl dibin , di rêveçûna leşkerî de dikevin pêşiyê .

Lê alên miletên dîl û exsîr , wek ya miletê me , ji her derî biderkirî , lihevtewandî , li ser dilê zaroyên wan de hilandî ne . Miletên dîl dixebitin , xwîna xwe direjînin ta ko biyaniyan ji welatê xwe biqewirînin û alên xwe li ser kelat û bajarên xwe ji nû ve daçikînin .

Ala her miletî bi çend rengan e û bi şiklekî din e . Ala kurdan ji jor ber bi jêr ve , ser hev , sor , spî û kesk e , di nava wê de roj diçirise . Divêt em hemî bixebitin û vê rojê hilînin ,ber bi ezmanê Kurdistanê ve bilin bikin ; li wê bibrûskînin , welatê xwe ser avahiya xwe a pêşîn vegerînin û di bin tava wê de biserxwe û bi kamranî bijîn .

Celadet Bedir - Xan .

## Ey Reqîb !

Ey reqîb her mawe qewmî Kurdzman ,
Na y şkênî daneyî topî zeman .
Kes ne lêt Kurd mirdiwe , kurd zindiwe
Zindiwe , qet na newê ala keman .

Ême roleyî Mîdya û Keyxusrew în ,
Dîniman , ayîniman e nîştiman .
Kes ne lêt kurd mirdiwe , kurd zindiwe
Zindiwe, qet na newê ala keman .
Ême roleyî rengî sûr û şûriş în ,
Seyrî ke xwênawî ye raburduman .
Kes ne lêt kurd mirdiwe, kurd zindiwe,
Zindiwe , qet na newê ala keman .
Lawî kurd hestaye ser pê wek dilêr ,
Sa..be xwîn neqşî eka tacî jiyan .
Kes ne lêt kurd mirdiwe , Kurd zindiwe
Zindiwe , qet na newê ala keman .
Lawî êste ş hazir û amadeye ,
Canfida ye , canfida ye , canfida .
Kes ne lêt kurd mirdiwe , kurd zindiwe,
Zindiwe , qet na newê ala keman .

---

Mawe = maye , Ne lê , na bêje . Mirdiwe = miriye ; Zindiwe = jîndar e ; Na newê = nizm na be ; Ala keman = ala me ; Role = zaro ; Nîştiman = welat ; Xwînawî = xwîndar , têr xwîn ; Raburdu , paşî , borî , serborî ; Hestaye = rabûye ; êsta = niho ; Sa = binêre ; Ş = jî; î = lê , mîna lê binêre

## Marşî Pêşmerge

Pêşmerge yin , pêşmerge yin,
Pêşmerge yin , be helmet în ,
Palewanî milet în ,
Şêrê rojî zilet în ,
Lê pênawî serbexoyî Kurdistan ,
Bext ekeyin jiyani man , mal û giyan ,
Le pênawî serbexoyî Kurdistan .

Pê binête xakî man dijmini kafir ,
Dar û berd û xol î lê dikeyn be agir ,
Her be zûyî ey bezênîn ,
Ta sinûrî man ey retênîn ,
Kurdistanî gewre y lê we yekdehênîn ,
Bext ekeyin jiyaniman , mal û giyan ,
Le pênawî serbexoyî Kurdistan .

Zorî serkeş hewlî dawe Kurd ne hêlê ,
Xakî Kurdistan be bombe û çek bikêlê ,
Heldêraw in l' em kêwane ,
Bûnete pendî zemane ,
Em welate goristanî dijminane .

Bext ekeyin jiyaniman , mal û giyan ,
Le pênawî serbexoyî Kurdistan .

---

Bo = bi ; Helmet = çalakî ; Pênaw = rê ; oxir ; Serbexoyî = serxwebûnî ; Bext ekeyin = didin , fida dikin ; Pê bi-nête = heke pê lê kir ; Xak = ax ; Retandin = avêtin ji derve , qewirandin , der kirin ; Gewre = mezin ; Yekde-hênîn = pêk tînin , teng dikin ; Bezênîn = bezandin , rewandin ; Hewlî dawe = ceribandin ; Bikêle = wêran bike , kavil bike , xira bike ; Heldêraw = gêr kirin ; Kêw= çiya ; Kêlan = cot kirin , erd rakirin .

## Li ber tevna mehfûrê

Rindê û Zîzê xwehên hev û ji bavê xwe sêwî bûn . Bavê wan Bengî axa , digel brayê wan ê mezin Zinar û bi çend pismamên xwe ve di wextê Şêx Seîdê rehmetî , di şerê serxwebûna Kurdistanê de ji bona welat û miletê xwe , di meydana rûmetê de , keti bû .
Rindê sèzdeh û Zîzê panzdeh salî bû . Brayê wan ê piçûk Gefo Hêj nû keti bû nehan .
Şerê biserxwebûnê ji heşt mehan bêtir ajoti bû . Eskerên kurdan bi ser Diyarbekrê de girti bûn , keti bûn nav Xerpêtê û bajarên Kurdistanê ên din .
Ji ber ko tifaqa kurdan ne yek bû , mirovên wan ên xwenda ko bikarin karên serxwerabûnê bigerînin kêm bûn û ji hêlekê din jî , di çend deran de , bêbextî li eskerên kurdan hati bû kirin ; serxwerabûn ne çû serî û tirkan ji nû ve Kurdistana bakur vegirtin .
Serek Şêx Seîd û mezinên kurdan bi dar ve kirin , jin û zaroyên wan , bi hezaran kuştin , malên wan talan kirin .
Di vê navê de mal û gundê Bengî axa jî hatin talan kirin û jin û zaroyên wî jî birçî û tazî man .
Xelkê mala Bengî axa êdî ni karî bûn di cihê xwe , di gundê pêşiyên xwe de bimînin .
Deya wan , jinikekê jêhatî , zaroyên xwe da bû hev û guhasti bû bajarekî piçûk , li cihêkî welê ko tukesî ew nas ne dikirin .
Dê ji sibê heta êvarê di mala xelkê de dixebitî , bi şev gore diristin û dîsan kara wê bi kotekî têra debara wan dikir . Lê diviya bû ko ew çend pere jî bidin alîkî û ji bona xwendina Gefo bicivînin .
Ma Bengî axa ne wesandi bû ko bila Gefo bixwîne , mezin bibe , evdîna bav û welatiyên xwe veke û di reya felata, azadî û serbestiya welatê xwe de bixebite .
Ji xwendinê re dirhav , pere diviya bû . Dê xwe dişidand, hêj bêtir dixebitî , lê tiştek bi ser de ne dixist .

Ji bona anîneiha wesiyeta mêrê xwe Jina Bengî axa qerara xwe da û her du keçên xwe êxistin xebatê .
Di vî bajarî de mehfûr çêdikirin . Keçik , diwextê xwe şiyê de , bi çêkirîna mehfûran mijûl dibûn , pê dileyistin ; ji lewra gelek ne ajot ji her duwan re xebat hatê dîtin .
Hero, serê sibehê xelkê mala Bengî axa kar dibûn û her yek bi alîkî ve diçû . Dê mala xelkê , keçik tevnê û lawik xwendegahê .

---

Gelek ne borî zivistana Welatê jorîn bi ser de hat .
Cilên keçikan tenik û kevin bûn , li wansar bû , Zîzê çend caran nexweş ket . Lê diviya bû li ber her tiştî rawestin û bixebitin ., dako wesiyeta Bengî axa li erdê ne hêlin û bînin cih .
Ew keti bûn çileya zivistanê . Dihate bihîstin filan duhî bi şev bi rê ve qufiliye . Kûçe û kolanên bajêr bi berfê dagirtî bûn . Çend ban ji giraniya berfê hilweşiya bûn .
Tevna ko Zîzê û Rindê li ser dixebitîn di holekê de vegirti bû . Banê holê qulêr û pîpokên kulekên wê şikesti bûn .
Rojekê her du xweh li ber tar û poyên tevnê rûniştî hepo lêdixistin . Her du jî, ji sermayê direcifîn , dranên wan dirikrikîn , gumikên Zîzê qerisî bûn , hepo ji destê wê ket û du hêstirên germ di ser hinarikên wê re çûn . Nema dikarî bû li ber êşa sermayê bisekine . Bi dengê xwe ê zîz gote Rindê :
- Rindê , xwîşkâ ! Ma êdî ne bes e ?
Tu na bînî ko em her du jî qufilîne ?
De rabe em herin mal , bikevin nav cihan û canên xwe bigermînin .
Rindê zû da pê hesiya bû , lê xwe berdar ne dikir . .
Dîsan ji nefsa xwe re bû xweyî , ne da ber sistiyê , tenê xweha xwe da himbêza xwe , guvaşt û maç kir .

---

Rindê ji Zîzê bi du salan mezintir bû . Lê diwê çaxê de ev du sal hing pênc salan hêja bûn . Rindê ji deya xwe bêtir pê mijûl dibû û ew bi xwedî dikir . Zîzê hêdî hêdî digirî lê ne dinalî . Rindê destên xweha xwe , di nav yên xwe de , diguvaştin û dixebitî ko wan germ bike . Piştî gavekê xweha xwe rûnand rex xwe û jê re got :

- Ma Zîzê tu ni zanî ko xebata me ji bona Gefo ye ; ji bona xwendina Gefo ye ?

- Belê Rindê çawan ni zanim , welê ne bûwa kengê deya me em dişandin xebatê .

- Ne xwe çire digirî ?

- Tu na bînî êdî na girim , lê tiştek heye , ma dinya tev ne zivistan e , bihar û havîna wê jî heye . Bila Gefo li havînê bixwîne û li zivistanê em tevda li mal rûnin , ma na be ?

- Dibe Zîzê , lê bavê me wesandiye ko bila Gefo zana be , bizane rêzika dinyayê bigerîne . Ji bona wê xwendina havînê ne bes e , têr na ke , Gefo divêt li zivistanê jî bixwîne , da ko zana bibe .

- Ma çire Rindê ewende bixwîne . Bila bi qasî kekê me Zinar bixwîne , ne bes e ? Zana bûn jî jibona çi ?

- Ji bona welêt Zîzê !

Heke kekê me Zinar qenc xwendi biwa roja ko eskerên kurdan bi ser Diyarbekrê de girti bûn ne dihişt ko esker bibin çend bir û herin bajarên din û di dora Diyarbekrê de kêm bibin . Lê bi êrîşekê Diyarbekir distand û mesele safî dikir . Dibêjin ko yê xeberê dijminan bi xwe gotiye . Te nîha seh kir ?

- Belê , Gefo bixwîne û welat !

- Û welat xelas bike , bigihîne azadî û serbestiyê . Welat bixebata mirovên xwenda xelas dibe .

- Koxelas bû dê bibe çi ?

- Dê bibe bi serê xwe .

- Ko bû bi serê xwe ?...

Serhosteyê ko yêkî tirkbû li wan daborî , bi ern , gote wan : " Yinemi lakirdi kurd piçlerî .."
Keçikan bi tirkî ni zanî bûn . Lê ji awayê gotina wî seh dikirin ko xeberan dike wan . Keçikên din ko di holê de dixebitîn bajarî bûn û hin jiwan kêm û zêde bi tirkî dizanî bûn û pê xwe diparastin .
Tenê Rindê û Zîzê , ko bi tirkî ni zanî bûn diketin ber çavên serhoste . Serhoste digot : " Dîsan galgal ne ! Pîncên kurd..
Ev ne cara pêşîn bû . Lê Rindê û Zîzê ni karî bûn hînî tirkî bibin . Her car wek cara pêşîn li ber diketin , lê deng ne dikirin .. Deya wan ji wan re goti bû , deng me kin., heta ko em bigehin miradê xwe , Gefo bidin xwendin .
Ko serhoste dûr ket , Rindê gotina xwe pêş ve ajot :
– Ko Kurdistan bi serê xwe bû , hingê her tiştên welatê me jime dibin . Ev serhoste jî ji kurdan tête bijartin û pirsa kurd ne wek îro pirsa dijûnê lê pirsa pesnê dibe . Ne tenê serhoste lê ji hakiman heta paleyan hemî ji me , ji miletê me dibin . Wê gavê ev zmanê ko em pê daxêvin û li me şêrîn e di her. derê de têtе gotin û bihîstin . Îro em di zîvzriyê de ne.., malên me ji destê me hatine standin . Çire ? Ji ber ko em kurd in û dewleta kurdan nî ne .
Bavên me , brayên me , pismamên me bi dar ve kirin . Hemî ji nezanî û ji bêbextiyê . Lê gava em bûne biserxwe , hingê kurdanî ji me re heqê jiyînê dide . Ji bona standina wî heqî ji me re brayên xwenda divên .
Welatê me xweyiyê zaroyên xwenda bûwa heta niho bi serê xwe dibû/bû bav û brayên me ne dihatin kuştin , em jî ne diketin vî halî , serhoste jî xeber ne dida me .
Niho ket serê te ko ez û tu em dixebitin dake yekî ji wan mirovan bixweyî bikin . Ew jî brayê me yê piçûk Gefo ye .

INSTITUT KURDE de PARIS BIBLIOTHÈQUE

Zîzê dengê xwe biri bû . Ne digirî , ne jî tiştek digot .
Dest avêti bû hepoyê xwe û dixebitî . Wê hepoyê xwe wer digu-
xiland ko tiliyên wê ji gumikên xwe qey agir vedimistin .
Tenê di vegerê de qewîtî li Rindê kiribû ko ji deya xwe re tişteki ne bêjit .

---

Sibetirê dinya hêj sartir bû , Rindê û Zîzê çû bûn xebata xwe .
Heta hingurê jî xebitî bûn .
Gava vegeriyan hatin mal û rojaniya xwe dan deya xwe , dê dît ko Zizêvwê rojê ji xweha xwe qemeriyek û nîv bêtir anî bû . Berê jê kêmtir dianî . Dê ecebmayî ma . Ji Zîzê pirsî . Zîzê got :
- Dadê heta niho min rind ni zanî bû em çire dixebitin .
Rindê qenc da min seh kirin û ket serê min û îro min ji Zîzê (I50) girê bêtir girêdam .
- Zîzê ji te re çi got ?
- Jê bipirse dadê , ez wek wê ni zanim rind bibêjim .
Rindê û Gefo jî xwe gihandi bûn wan . Rindê dest bi gotinê kir lê ni karî bû biqedîne , çavên wê hêstir dikirin , dê jî digirî .
Di guhekî mezelê de piştxencera Bengî axa hilawistî bû . Jû pêve di destên wan de tu tiştê wî ne ma bû .
Wan ji xwe re kiri bûn adet , di demên tengî û zîziyê de ew ziyaret dikirin .

Her çaran berên xwe dan xencerê û ketin himbêzên hev .

Celadet Bedir-Xan

## Du Egîd

Du egîd çû bûn şerê azadî û serbestiya welêt û dîl keti bûn . Gava ew birin nav koma dijminan , wan serê xwe da ber xwe , seh dikirin ko kurd şikiyane , şer sekinîye û sĕrekên kurdan hatine girtin .

Her du egîd liser wan xeberên tehl digiriyan û yekî ji wan digot : " Çiqas ez têşim , brîna min çiqas dişewite .

Yê din digot : " Stran vemirî , govend sekinî ye . Min jî divê , ez bi te re bimirim , lê li pişt min ve jin û zaroyên min hene , bê min , ew dê perîşan bibin !..

Brîndarî lê vegerand :

- Pîrek ji bo min çi ye ! Zaro ji bo min çi ne ! Pêteke bilindtir di dilê min de rabû ye . Pîrek û zaro , heke birçî ne berde , bila herin bigerin , welatê min , welatê min winda bûye .

Hevalo ko ez mirim , kolosê min deyne ser sînga min , tifinga min bide destê min û xencera min bêxe nav pişţika min . Ez dixwazim wisa rakevim û bibihîsim wek nobetdarek di gorinê de , heta ko dengê topan û şehîna hespan bên .

Dema ko reprepa hespên kurdên mêrxas di ser gora min re dê biborin û dengê tifing û topan , bombe û balafiran dê bên , ez ê bi çekên xwe ve ji gora xwe/hilavêjim ji bona serbestkirina welatê xwe , ji bona azadkirina welatê xwe .

---

## Du Dengbêj

Di wextê kevin de qesreke bilind û xemilandî hebû . Rewşa wê , zîneta wê diket ser kulîlk û mêrgên deştan û hetanî avên çem û robaran .

Çarnikarên qesrê bi bexçeyên têr reng û têr bihn bi gul û gulçîçekan girtî bûn .

Ew bexçe mîna taceke zîvîn û zêrîn bû û qesr di nêv de wek rûyekî dilruba , şêrîn û wek tîrêjên rojê dibiriqî . Ji şehderewan û quleteynan avên zelal û bi kef xwe davêtin

jêr û jor û car car xwe hildavêtin û bilind dibûn bal ezmanan ve , wek keskesoran reng didan û dilop , dilop mîna mirariyan diketin ser lêvên gula sor , ser pora sosina zer û çavê xenceliskî ê reş de .

Di wê qesrê de mirovekî xedar û zalim rûdinişt . Wî zalimî ew qesr ne bi xurtiya xwe girti bû , lê Kurdistanê ew wek mêvanekî ezimandi bû nik xwe .

Kurdistanê goti bû : " Ev misilman e , brayê me ye , nav beyna me de çi ferq heye , misilman hemî brayên hev in , bila qesra me ya mezintir û spehîtir jê re be û em ê bindestiya wî bikin , xelîfe ji wan e .

Ew zalim , divê qesrê de , li ser textekî bilindmû zêrîn û bi ebanos û dranên fîlî û bigewher û mirariyan xemilandî rûnişti bû , girtin û berdan di destê wî de bû . Wextek borî . Ew dem bi dem bû xira û serxweçûyî .

Her fikra wî bêbextî , her awira wî ern , her gotina wî xirabî û her nivîsandina wî têr xwîn û xwînxwarî bû .

Rojekê du dengbêjên siwarî diçûn bal qesra wî ve , yekî ji wan bi ceyndik û temeriyan , bi porine zer ciwan ê din bi porên spî pîr bû . É pîr ji ciwanî re digot :

" Kurê min , stranên me ên spehî û xweş bîne bîra xwe , zexmî û xurtiya xwe , stranên me yên bi ken û girîn û bi şahî û şîn dane serhev , dengê xwe yê zirav û melûl hêdî hêdî berde , em diçin qesra kc tê de zalimê me , xedarê miletê me rûniştiye , divê em dilê wî yê hişk û hesinî binermijînin .

Zalim tevî hevalbendên xwe ve , digel wan hin kurdên bêbext û bê namûs jî hebûn , di dîwanxaneyê de civiya bûn . Zalim li ser textî rûnişti bû wek ewrekî reş , di tenişta wî de jina wî Zîn , jineke kurd , mîna gulên biharê rengîn û geş .

Dengbêjan dane ji derî ve dîtin dîwanxaneke bi xeml û rewş , ji mirovan tejî , lê bêdeng hatin pêşberê textî sekinîn .

Çavên biern û kînên komê ketin li ser rûyê dengbêjan , bi tenê

du çavên delal wek du stêran li wan kenî . Ê pîr dest û tiliyên xwe ên gewr û zirav ser telên sazê ve anî , yê ciwan bi dengekî melûl û şewitî dest bi stranê kir .

Straneke spehî û bê hevrî bû , straneke germ û şîrîn . Sazbend û dengbêj , bi hev re , ji bihar û havînê , ji dilketî û dezgîranê , ji şahî û şînê , ji xemgîrî û bextreşiyê distiran , ji her tiştê ko dilî nerm , hişî bilind dike' , ji her tiştê ko can û giyan pê dikeve , divêsihe an xemgîr û hiznî dibe , dişewite û sîng pê dikelişe .

Dengbêjê pîr bi dengekî qebe û giran li dengê dengbêjê ciwan ê zirav û dilkul vedigerand .

Stran qediya , Zînê ji sînga xwe gulek vekir û avêt bal dêngbêjan ve . Eniya zalimî qermijî , rû zalimî têkre çû , ji çavên wî ên hov agir dibarî , da ber qîra û ji dengbêjan re got : " Ji jinên min , di destê min de , bitenê ev ma , di vî welatî de we her tişt bi jehr kir , niho hon dest jin û canê min jî dikin , hiş û dilê milet ket destê we , xelk ji bona navê kurdîtiyê dest ji jiyîna xwe berdidin , xwe bi canfidakariyê , bi mirinê girêdidin .

Zalim ji cihê xwe rabû , gurçk danî dengbêjê ciwan û ew gûr di kezeb û pişta wî re derket , xwîneke germ û sor li ser sînga wî de herikî .

Bêdeng her du dengbêj , yê ciwan nîv mirî , ji dîwanxanê derketin . Du hêstir ji çavên Zînê rejihan û wek du mirariyan ketin ser tiliyên wê ên zirav û nerm .

Dengbêjê pîr digel hevalê xwe yê ciwan hema ko ji qesrê derketin rengê xortî zer bû , gelek zerikî , laşê wî recifî ket erdê û mir .

Wê demê dengbêjê pîr destên xwe ên bixwîn raberî ezmanan kir û got :

" Qesra bêext paşiya te şewat , hilweşandin û xirabî be ! Ji rewş û xemla te bila êdî sih jî ne mîne kulîlkên

bexçeyên te êdî bila ne bişkivin !...
Bûka biharê tucar nîzîkî te ne be , ji bêriya bihn û reng , xweşî û geşiyê perîşan bibî , vemirî , bimirî !
Bila navê te jî winda bibe , kavil û xirbeyên te jî ne mînin !
Hîmên xirbeyên te , di sînga welatê Kurdistanê ya spehî û delal de , wek brîneke her bimîne , zilm û ezabên esaretê her bîne pêş çavên kurdan , pêş çavên Kurdistanê .
Dengbêjî got , Xwedê bihîst .
Ev çend sal in her roj kevirek ji dîwarên wê qesrê dikeve , dikin na kin pêk ve na cebire .

---

## Rasthatineke Ecêb

Li Bexdayê hevalekî min hebû ; ew jî mîna min çerçî bû . Ez û ew em qederekî bi hev re man , paşê ez vegeriyam Şamê .
Li karekî geriyam , min ne dît . Rojekê min rojnameyeke Misrê dixwend , ev xebera ha ket ber çavê min : "Bexçeyê tebayê Misrê paleyekî xebatker divê , werin ba gerînende . "
Gelekî kêfxweş bûm , hema li trênê siwar bûm û min berê xwe da Misrê û hema ko gihame Qahirê ; derbasî bexçê bûm , gerînende derket pêşiya min , li min mêze kir û got :
." Ji rûyê te xuya dike ko tu ê xweş bikarî texlîtê meymûnan bikî . " Ez ecêbmayî mam ko çi bibêjim ê ,wê gavê gerînende got :
"Meymûneke me hebû çend roj berê çû rehmetê . Me diviya bû meymûneke din peyda bikin . Em ni karin dewsa wê vala bihêlin , tu dixwazî çermê rehmetiyê li xwe bikî û bikevî şûna wê , roja te bi dînarekî ?
Min got : " Erê ! " û bes .
Min çermê meymûnê li xwe kir û car , carina lîskê wê texlît dikir . Min xwe bi ben digirt û radipelikîm û minxwe carina çeng dikir cihê dûr .
Carekê destê min sist bû , ji ben şemitî û ketim xwar.

Min dît ko şêrekî gir li hemberê min e . Ji tirsa zravê min qetiya , canê min lerizî ; ez tirsiyam ko şêr min perçe bike û bixwe .
Şêr nîzîkî min bû û destê xwe bi dilovanî danî ser milê min û got : " Ez jî mîna te çerçiyek bûm .." û xwe ji çermê xwe kişand , min dît ko ew hevalê min ê Bexda ye .

Q. C.

---

Di dora lihevxistina zmanan de

Gava Xwedê dinê afirand û ew ava kir , jê re pêvekirin ango intizam da ; ji lewra ko bê pêvekirin ango bê intizam tu tişt na gihe serî , tucar ni kare heta paşiyê bimîne .
Her tiştên dinê di destên qanûnan de ne ; Tu tişt ni kare xwe ji rêz û rêzikên qanûnan , ji fermanên wan bi dûr xe, jê bifilite .
Intizam ji nizamê derdikeve û nizam ji qanûnê .
Qanûn ev rêz û rêzikin ko bisemt , birê , bicih ,û rast à . Xwe her car na guhêre , lisersekinî ye , herwekî rabûye welê jî pêş ve diçe , her tişt û awayên wê abadînin.
Qanûn du texlît in ; A pêşîn ew e ko ji mêj ve , ji berî ve ji ber Xwedê ve an ji xwezayiyê ango tebîetê hatiye danîn , ango daniyê wê Xwedê û xwezayiyê ye .
A din ew e ko ji ser ú mejiyê mirovan , ji hiş û jiyîna wan ya civakî ji dîrok û rêzikên wan têne û hatine pê .
Ji wan rêz û rêzikan qanûnên civakî tê gotin .
Di vê dinyayê de zayîn û mirin , ciwanî û pîrî , rabûn û ketin , pêşveçûna miletan , paş ve mayîna wan , serbestî û azadiya neteweyan an di esaretê de mayîna wan bi hikma qa - nûnan çêdibin .
Herwekî bihar û havîn , payîz û zivistan , roj û şev , boşbûna bayî , barîna baranê , dahatina berfê li gora qanûnan çêdibin .
Tu kes li ser wan qanûnan ne xwedî hikm e . Qanûnên civakî li ser civat û miletan , komên mirovan xudan hikm in . Ev qanûnên ha tên gohartin , dikevin şiklekî din .

Ji ber ko bêgohartina wan , ji bona mirovan, pêş ve çûn nî ne .Bitenê bi gohartina rêz û rêzikên civakî civat û miletên dinyayê pêş ve diçin , heqê xwe distînin û dikemilînin .
Dîroka dinyayê raberê me dike ko gelek milet keti bûn bin destê biyaniyan , keti bûn dîliyê , hêsîriyê û bi sedan salan ve di bin hikmê biyaniyan de ma bûn .
Pêşdetir bi xebat , bi camêrî , bi fidakarî , bi pêşveçûna civakî , bi zanînê ew miletên ha xwe ji bindestiyê , ji hêsîriyê vekirin , ji bin nîrê zilm û neheqiyê rabûn , xwe aza kirin û bûn bi serê xwe .
Ma kî heye ko ni zane Xwedê hesin çira afirandiye ?
Xwedê ew afirandiye ji bona ko dil ne dikir tu milet , ne yek jî , xulamiya miletekî din bike .
Xwedê hesin afirandiye ji bona ko miletên dîl pê qelem , tifing û top û berikan çêkin û xwe ji bindestiyê , ji nîrê xulamîtiyê bifilitînin , xelas bikin .
Heye ko mirov ji xwe bipirse ma çima hin miletên dinê neyaritiya miletên din dikin .
Ji ber ko pirî car xurt bê rehm e , zalim e û heq çi ye nas na ke . Yê ko ne xurt e , xwe ji bindestiyê xelas ne kiri ye mîna pezek e li ber gurî !
Dermanê hêsîriyê xebat , yekbûn û şer e .
Ji xweher dema jiyîna me , her çeliqandina me , her gavekê xebata me şerek e .
Ne bitenê em , çarwa , heywan û giya jî di şer û lihevxistinê de ne . Jiyîn û mayîna me tenê bi xebat û şûrişê ye . Yê ko xwe ji xebat, ji xebat û şûrişê dide paş dikeve çala xulamîtiyê , zîvariyê , dikeve çala mirinê .
Zman jî wek her tiştê candar li hev dixin , li hev-hatina wan nî ne .
Ji ber ko zmanin hene ko dixwazin mezintir bibin , hawîr - dora xwe vekin , bikevin ser lêvên nû , hişên nû .
Jû pê ve zmanên hene ko dil dikin zmanên din bikujin û

û bikevin şûna wan . Dîroka dinê, ji me re , dide zanîn ko heta niho gelek zmanên miletan hatine kuştin . Ji wan zmanan re " Zmanên mirî " dibêjin . Pevçûn û lihevxistina zmanan kher û bêdeng e .
Belê ev şer bê deng e , bê top û tifing e , bê bombe û balafir e lêbelê hikmê wî ji her şerî bêtir , mezintir û xirabtir e .
Di şerê zmanan de rihê zmanan tên standin , xurtiya dil û canên wan tên şkênandin û pêta heyîna wan û heyîna miletê ko bi vî zmanê daxêve tê vekuştin .
Zmanên ko li hev dixin , dest bi kuştina pirsên hev dikin . Dil dikin , herçend heye ewçend bikevin hindurê zmanên din , tê de cih bibin , cihekî qaim bigirin , hêdî hêdî bikevin kûrahiya wî zmanî û di pêşiyê de çarnikarên wî bigirin , wî ji hîm û riknén wî hilweşînin û ser xirbeyê wî cihê xwe çêkin .
Herçend jî zmanê me , heta niho , ne ketiye bin vê talukeyê heke ... em lê miqate na bin , çavên xwe venakin , roj berî rojekê hînî xwendin û nivîsandinê na bin , zmanê me yê delal û şîrîn , zmanê me yê spehî û bedew dikare bikeve bin talûkakê mezin !....
Pêşîn, divê em bizanin ko gelek pirsên biyanî , bê sebeb û hewcedarî , ketine nav zmanê me ; gelek kurd hene ko zmanê xwe ji bîr kirine ; pê ni karin baxêvin , bixwînin û binivîsînin . Ev hal dawiya lihevxistina zmanan e .
Ji aliyê din piraniya kurdân ko zmanê xwe gelek baş dizanin ni karin zmanê xwe bixwînin û binivîsînin !
Ev tişt birînek e , birîneke xedar !
Kurd halê şerî rind dizanin . Dijmin , pirî car , bi derbekê perî[illegible]a be . Di şerê zmanan de jî wilo ye .
Her pirs kozikek e û her pirsa ko em pê emel na kin ji zmanê me dikeve û winda dibe , li şûna wê pirseke biyanî tê û dikeve dewsa wê , welê kozikek ji destê me diçe . Bi pêşveçûna vî halî kozikên me , wirde wirde ji destê me diçin .

Bi pêşveçûna vî halî kozik yek bi yek ji destê me dertên û dawî em bi tevayî şargeha xwe winda dikin . Zmanê me wek miroveki brîndar , nesax dikeve , sist dibe û dimire .

Vêca ji bona vejandina zmanê me divêt kurd hemî fêrî xwendin û nivîsandinê bibin û gava daxêvin an dinivîsînin bala xwe bidin û pirsên ne kurdî , bê sebeb , tevlî zmanê xwe ne kin . bi vî awayî zmanê me pirsên xwe yên ji bîra kirî an windabûyî , ji nû ve , peyda dike . Ji milê din jî pirsine nû dizên û têne çêkirin û halo zmanê me vedigere ser xurtiya xwe ya pêşîn .

Miletekî dîl û exsîr ko zmanê xwe winda ne kiriye wek gitiyek e , mehbûsek e ko mifta zindana xwe , bi xwe re hilaniye .

Zmanê me gelek kevn e , zmaneki dewlemend , spehî , fireh û qaim e . Divê em zmanê xwe rind bizanin û di nav xwe de bi tenê bi zmanê xwe baxêvin .

Brano , pismamino , xortino roj berî rojekê hînî xwendin û nivîsandina kurdî bibin !

---

## Strana Xebatê

Jiyîna te ne xewnek e , tu belengaztir an dewlemedtirê mirivan jî bibî ; bizane ko di destên te de ji jiyîna te hêjatir û bilindtir tu tişt nî ne !

Tu xwdiyê jiyîna xwe yî . Rojek dê bê û ji xwe bipirsî : " Gelo ez di jiyîna xwe de ji bona çi tiştî xebitîme û min çi pêk anî ? ? "

Beriya ko dema vê pirsê tê bersîva wê bêxe destê xwe , bixebite weke camêr dixebitin , ne bitenê ji bona nefsa xwe lêbelê ji bona welatê xwe , ji bona welatiyên xwe , ji bona jin û mêr û zaroyên Kurdistanê !

Ji kirin û axaftinên te bila ronahiyek hilavêje !
Xwe bilezîne û bixebite !

Heke tiştekî mezin ji te der e , ji qeneve hînî xwendin û

nivîsandina zmanê xwe yê şîrîn bibe û ko tu rind hînî xwendin û nivîsandinê bû , xelkê mala xwe , mam û pismamên xwe , heval û cîranên xwe fêrî xwendin û nivîsandinê bike .

Xebata mirovekî mîna ava kaniyekê ye . Xebatên mirovan digehin hev, wek avên kaniyan û ji kombûna wan şet û robaran çêdibin .

Rohelatê serbestiyê roniya xwe dê bavêje ser vê avê .

Ezman bê stêr na be lê çavekî divê lê bigere . Guh nî ne ko na bihîse lê mirov divê ji bihîstinê hez bike , ji bihîstina tiştine rast û carina jî tehl .

Bixebite, bizane ko şev / zû bi ser me de tê , şev di pey me de ye , zûka dora me dê bigire . Ji xebatê tiştine çeleng , bikêrhatî , biservehatî hil tên !

Hêvî rojhelatê xebatê ye .

Rastiya mezintir , di vê dinyayê de ev e : " Xebata xwe bizane û wê pêk bîne ! Bixebite ,tu ê heval û destbrayan peyda bikî , ew destê te bigirin û ji dil bibin arîkarên te . Li dora xwe me nêre û ji xwe re me bêje hevalê min , pismamê min na xebite , çire ez vî barî hilgirim ? Roniya çavan bi qîmet e , giran biha ye , wê erzan me ke , bi vê ronahiyê xebata xwe ronak û germ bike !

Di dilê te de, divê hêlînên rastiyên xurt cih bigirin !

Dilê xwe deyne ser sidanê xebatê , hesin li ser êgir û li ser sidanê xebatê, dibe pola .

Kurdistan hewcedarî dilên xurt , dilên polayî ne .

Gava rastî li ber te dibirige çavên xwe tu car girê me de , çirîsk û brûskên rastiyê weke mirariyan dê bikevin ser xebata te . Bi çavên geş lê binêre û bibêje :

" Xebata , rastiya de lal , dem hebûn ko hon li min giran dihatin , tehl dihatin , lê ez niho hevalbendê we me , tu heval bi qasî we ne şîrîn e .

Ketî bi xebatê radibe , heke, karekî de, zora te hate birin, dilşikestî me be , tinê bi xebatê tu dikarî tola xwe hilînî .

Xurtiya te di baweriya te de ye , di dil û destên te de ne . Hêvî zeviyek e , xebat tov û çandiniyên wê ne . Heqê te bi qasî xebata te ye , jê ne pirtir û ne jî kêmtir e . Bi dilxwşî bixebite , di dema xebatê de , wek roja havînê ronak û germ be . Yê ko bi dilxweşî dixebite, xwediyê xebata xwe ye , lê yê ko bi dilsarî di - xebite xulamê wê ye . Camêr ji serbestiyê hez dikin û xwe ji xulamîtiyê dûr dixin .

Herwekî,di rojhelatê de, tirêjên rojê zora şevê dibirin û dora dinyayê hêdî hêdî ronak û geş , çeleng û rondar dikin , wisa jî rohniya xebata te zora tariyê dê bistîne , dora te ronak bibe û bi vê ronahiyê , rê û şehreyên pêş-ketinê dê vebin .

Xebata xwe bizane û wê pêk bîne .

Xebata pêşîn , ji bona me hemiyan hînbûn e , fêrbûn e !

Hînbûn û fêrbûna çi ?

Hînbûn û fêrbûna xwendin û nivîsandina zmanê me , zmanê me yê delal û şîrîn : Zmanê Kurdî !

Brano , xwîşkino , mam û pismamino , xortino , zaroyino! Heke em payedariya kurd û Kurdistanê dixwazin , heke em ji azadî û serbestiyê hez dikin , hema destên xwe bavêjin Kitêbên kurdî û dest bi xwendin û nivîsandina kurdî bikin .

Yên ko çûne heta Heyvê , di destpêkê de hînî xwendin û nivîsandina zmanê xwe bûne . Destpêka zanînê bi Elfabê destpêdike .

---

Rovî û Toz Beg .

Dinya sar bû . Roviyëk li çolê digeriya . Ew rastî aşe-kî hat . Qeraşê êş li hindur rûniştî bû û ji xwe re agirekî xweş çêkiri bû . Rovî hat ber devê deriyê êş û nêrî ko qeraş agirekî baş dadaye . Rovî ban kir qerêş û got ê :

- Tu dê bihêlî ez xwe li ber vî agirî germ bikim , ez dê

jinekê ji te re bînim !

Qerêş lê nêrî , dît ko li devê deriyê êş roviyek heye û vê xeberê dide . Wî lê vegerand û got :

- Were , xwe germ bike .

Rovî hat , xwe germ kir û got Qerêş :

- Mala te ava be , ez dê ji te re keça hakim bînim . Mêzênek te nî ne ?

Qerêş got :

- belê , heye .

Rovî got ;

- Pereyê te çend qirûş nî nin ?

- Belê , hene .

Rovî got :

- De , ka bîne . Qerêş jê re mêzênek û çend qrûş anîn .

Rovî got :

- De , li ser pişta min vê mêzênê bişidîne û van çend qirûşan biçikîne mêzênê de .

Û rovî rabû çû bajarê hêkim . Li bajêr rovî ket mala hêkim û dît ko hakim û civata wî rûniştî ne . Hêkim halo nêrî û dît ko roviyek da devê derî , rovî digirî .

Hêkim jê re got :

- Tu çima digirî ?

Rovî got :

- Ya hakimê min ez hatime gilî ba te .

-Bêje , çi gilî tu hatiyî .

- Ez li ba Toz Beg dixebitim .

- Toz beg çi karî bi te dike ?

- Ya hakimê min , ji sibehê heta êvarê peran bi min diwezinîne . Ez gelek westiya me û tadayiyan li min dike , min divê tu min ji vî halî xelaş bikî .

Hakim û civata wî man ecêbmayî . Hêkim jê pisî :

- Ma çawan , ev Toz Beg dewletek e , pereyên di wî çiqas zehf in ?

- Ya hakimê min , pereyên wî zehf in .

-Here vê neqlê , neqleke dî ko Toz Beg tadayî li te kir , were giliyê ,ez dê li te bipirsim .

Rovî çû ba qeraşê xwe . Qerêş jê re got :

- Te çawan kir ?

- Min fenika xwe li hêkim kir . Ma du car jê re , ez ê keçika wî bînim .

- Îcar , bi çi awayî tu dê herî ba wî ?

- Ka , ji min re çapekê bîne û li ser pişta min bişidîne . Qeraş jê re çapek anî û li ser pişta wî şidand . Rovî çû ba hêkim .

Hêkim lê nêrî ko va roviyê wî hat . Wî got :

- Îcar çi qewimiye tu hatiyî ?

- Ya hakimê min , min bi ya te kir û ez vegeriyam ba wî . Îcar wî barê min girantir kir ; heta niha bi min pere diwezinandin û vê hanê pere bi min dikêşîne ser xezna xwe û va ye , heke tu bawer na kî , va çapa ko li ser pişta min , ez pê dikêşînim .

Hakim ma heyirî û got :

- Kurê min , pereyên Toz Beg pir zehf in . Ez ni karim , tu tadayiyê lê bikim , ew wek dewletekê ye , bi qencî pê re bipeyive .

Rovî çû ba qeraşê xwe . Wî got rovî :

- Te çawan kir ?

- Ma carek , ez dê herim ê û ez ji te re keçikê dê bînim .

Rovî careke din çû ba hêkim û li ba hêkim giriya .

Hêkim jê re got :

- Tu çima digirî ?

- Ya Hakimê min , Toz Beg ji min re got : " Here , keça Hêkim ji min re bixwaze û heke Hakim na xwaze keça xwe bide min , ez dê te bikujim ". Ya Hakimê min , ez li bextê Xwedê û te me , tu min xelas bikî ji vî halî .

- Li ser çavan , here , bila Toz Beg bê em ê bibînin .

- Mala te ava , rûyê te spî be .

Rovî hat ba qerêş û jê re got :

- Rabe , em ê herin mala Hêkim .

Qerêş ji rovî re got :

- Mala te ava be , em ê çawan herin mala Hêkim , cilên min lewitî ne .

- De ,rabe ser xwe , xem na ke , ez ê awayekî ji te re derêxînim , ez ê bidebirînin .

Rovî rabû û qeraşê wî da dû , meşiyan û gihan nîzîkî bajêr . Ew rastî çemekî xurt hatin ; rovî ji qerêş re got :

- Tu cilên xwe ji xwe bike û xwe bavêje avê û ez ê bikim hawar .

Qerêş cilên xwe ji xwe kirin û xwe avêt avê , heçî rovî kir hawar û ber bi bajêr ve çû .

Ehlê bajêr pê re hatin û gotin :

- Çi ye , tu dikî hawar ?

Rovî gote wan :

- Toz Beg û eskerên wî , bi timamî , li ber avê çûn .

Xelk pê re hatin , Toz Beg ji avê derêxistin û anîn mala Hêkim . Hakim lê nêrî ko ew tazî ye ; Hêkim got ê :

- Ka cilên te ?

- Cilên min di avê de çûn , eskerên min jî çûn .

Hêkim ji xulamên xwe re got :

- Bedlekî ji yên min jê re bînin .

Xulamên Hakim bedlek jê re anîn . Toz Beg ev bedil li xwe kirin , her gav vî alî , wî aliyê xwe dinêre , wî hêj tiştekî welê ne dîtiye .

Hêkim lê meze kir û ji rovî re got bi dizî :

-Çire axayê te Toz Beg li bedlê xwe dinêre ?

- Ya Hakimê min , bedlê wî ji ev ê ko te nika lê kiriye çêtir bû , fedî dike ji ber vî bedlî .

- Xem na ke .

- Ya Hakimê min , em dê herin , îcar tu bûka me bide me .

- Li ser çavan .

Hêkim keça xwe li hespekî siwar kir û hezar esker bi wan-

re şandin . Toz Beg ji rovî re got :

- Ma îcar em wan bibin kû , li êş ?

- Ev xebata min e , ez li pêşiyâ we diherim , hôn hêdî hêdî li ser rê werin .

Rovî çû pêşiya wan , carek nêrî ko va ye qesreke mezin û xweş bi tenê ye . Rovî banî ket qesrê , nêrî ko va ye hûtek tê de razaye , lingê xwe lê xist û jê re got :

- Rabe ser xwe !

Hût jê re got :

- Çima ?

- Va ye . Toz Beg bi eskerên xwe ve hatin , ew ê te biku - jin .

- Ez çawan bikim ?

- Xwe veşêre !

- Ma ez li kû derê xwe veşêrim ?

- Derkeve ji derve .

Û rovî ew veşart , pûş li ser/wî danî û çû agirek anî û hût şewitand . Rovî piştre vegeriya ba eskerên Toz Beg û gote wan :

- Min cihek ji we re vala kiriye .

Wan keça Hêkim anî qesrê û banî xistin jor û eskerên Hêkim nêrî ko mala Toz Beg mezin û pir xweş e . Esker vege- riyan ba Hêkim . Hakim ji wan pirsî

- Xebera Rovî rast e an derew e ?

Eskeran got :

Xebera rovî rast e , wî rast peyiviye ,qesra Toz Beg ecêb spehî û çeleng e .

Toz Beg jina xwe xist qesrê û ew li nik hev û du man .

Rovî ji xwe re got : " Min ev qencî hemî bi Toz Beg re/kir , ez ê binêrim gelo qenciya min pê xuyaye an ne xuyaye .

Rovî xwe li nexweşî danî . Heft rojan rovî bi derewan xwe nexweş xist . Toz Beg jê aciz bû , ji jina xwe re got :

- Bi lingê wî bigire û bavêje ji derve .

Ew xebera wî rovî bihîst û jê re got :

- Qeraşo ! Ma na yê bîrat/te tu li ber êş bû û min keça

Hêkim ji te re anî û tu qenciya min nas na kî !

Jinkê gava mêrê xebera rovî bihîst jê re got :

- Ma qey . min qeraş bû ? !!

Rovî got ê :

- Erê !

Jinik xeyidî , çû mala bavê xwe .

Qeraş rabû û ji rovî re got :

- Ya rovî , ez li bextê +Xwedê û te me , min kir û tu ne kî , here û careke din jina min bîne , ez toban dikim li ber te .

Rovî çû bi dû wê û dît ko jinik wê xeberdanê ji bavê xwe re dibêje .

- Te ez dam qeraşekê .

Rovî li Hêkim nêrî , wî jê re got :

- Malxirabo , te çawan keça min bir ji qeraşekî re ?

Rovî got :

- No , ya Hakimê min , adeta me ye , ez jê re daimen wilo dibêjim , aşên wî hingî zehf hene û ew her diçe ba aşên xwe û ez jê re dibêjim qeraş .

Hakim vê gavê bi keça xwe de xeyidî û jê re got :

- Tu eybê vê axaftinê nî ne .

Rovî jinik anî û hat ba qeraş . Qeraş jî dilxweş bû .

Çend roj borîn , rovî nesax ket bi rast û mir .

Toz Beg nema wêre wî bavêje . Deh rojên drêj ew li hindur ma mirî . Toz Beg bawer dikir ko ew hêj sax e . Dawî jinikê got mêrê xwe :

- Bavo ! Bihna wî genî bûye .

Ew hatin , lê nêrîn ko ew bi rast miriye , ew birin û avêtin ji derve . Serê civata hazir sax be .

Methelokên kurdî :

" Dilê şivan bixwaze , dikare gulmast ji nêrî çêke .

Dizkê got:" Binê min zêrîn e ." Heskoyê got : " Ez niha ji binê te derketime ". Siwûrî ji darê ket , got : " Qentarek goşt ji min çû . Yê ko ne li şer e , şêr e .

Ji nivêjên brayên me Eyzediyan :

Nivêja Mîriyan .

Bi navê Yezdaê Pak ê Dilovan û Mihriban

Hey benî ademo ! Miskîno ! Jaro ademo ! Ev dinya mestan - xane ye . Wek xewna şevan e , felek siha daran e , hero yara hinan e !

Ka Silêmanî hikim dikir ! Ka Belkîsa nav dikir !

Tu jî xweş bî , ewan dinya ji xwe re terk dikir .

Ka Silêmanê peyxemberan , ka Belkîsa bi zêrî zeran ?

Tu ê xweş bî , Ew jî çûn nav ax û beran ...

Kanî Xidir , Kanî Ilyas , kanî Derwîşê bi tezbîh û weqas ?

Tu ê xweş bî , ew jî di nav axê de kirin qiyas .

Benî Adem li vê dinyayê me be tima , ev zêr û malî gelek me ke cima . Dinya bo resûlê Xwedê jî ne ma .

Ev dinya erdê derwîş e ,û tê de digerin cumleten ceyş e , kesek bi nefsa kubar na ç..e pêşe .

Kanî Hemze ? Kanî Elî ? Kanî ewliya ? Kanî enbiya !

Ew di nav gorinê de bûne tûtiya .

Mala gorinê çende kur e , çende tarî , tejî mar e , tejî mûr e . Ya Rebî ! Tu dikarî du aşiqan ji yek bikî dûr ,

Werin , werin xizm û lêzim , vê gavê giriya men bêt, dax û sed kovan û keser , xelkê şîrîn , lêvûn şekirnema bidin xeber . Qewî giriya me bê , hizn û girî bê feyde ye , gor û kefen mala me ye .

Megirî , me nal , hêstiran ji rûyê xwe bimal , ev dinya bo pêxemberê Xwedê jî ne ma .

Werin , werin , lêzim werin , en ê îro gelek bigirîn ,xelkê mêrga vemirî .

Heçiya dike , ew Mîr dike , xeyr û şeran xefîr dike , dexa dilan bapîr dike .

Ji çîrokên nivîsevanê rûsî yê namdar Tolistoî :

## Eyloyê Pîr .

Mîr Tacîn pîr bû . Lê di qesra wî de cariyên spehî û ciwan , cariyên bi bejnûbal û çeleng hebûn û hemiyan hejî Mîr dikirin , ji ber ko ew xweyagir û xurt bû .

Maçên wî şîrîn û germ bûn , jin hejî ramûsanên şîrîn û germ dikin . Ji xwe jin , ji mirovên hevîngerm û hiskûr hez dikin , ew peya ciwan an pîr in yek e . Xortî hevîn e , xurtiya rivîna dilî ye , ne çermê ter û ne lamên sorereng in .

Hemiyan ji pîrî hez dikirin , Mîrê pîr bitenê hejî yekê,ji wan , dikir , ji Perîxanê , keçikeke şingarî .

Di qesra Mîrî de sêsed carî hebûn , porzer û çavşîn , poreş û çavkesk , dranmirarî û lêvgul û hemî jî wek rohniya roja gulanê nerm û wek kulîlkên meha Adarê spehî û ter bûn .

Lê ne yek jî ji wan hinde keçika şingarî hevîn seh ne dikir û hejkirina wan bi qasî ya şingarî têr pel û pereg ne bû .

Ev sêsed jin bi xwarinên tamdar , bi bihnên spehî , bi şîraniyên xweş , bi ken û henekan wextê xwe diborandin . Bihna xwe bi blûr û kemançe , bi dehûl û erebane , bi stranên melûl û ahengdar vedikirin .

Mîr pir car ba xwe banî Şingariyê dikir .

Li ba mîr her tişt hebû , dewlemendiya dinê , spehîtiya jinan , rewşa keç û dotan , rengê mirarî û gewheran û xweşdiliya azahî û serbestiyê .

Mîr Tacîn , di koşa qesra xwe de , canê xwe yê westiyayî divêsihand û rojên jîna xwe yên paşîn bi keyfê diborandin .

Kurê wî Gurgîn xortekî camêr û mêrxas bû . Wî navê bavê xwe her bilindtirdikir . Ji talanên wî gencînê - yên qesrê û xezîneyên serayên Mîr tejî bûbûn .

Her tiştê ko dil dixwaze , çav diecibîne tê de hebûn .

Mîr Tacîn li Gurgîn :. her bi çavên hejkirinê mêze dikir û dizanî ko di destê xwe wî de navê wî , navên kal û kalikên wî , ji rewşa /tucar tiştekî winda na kin. Mîr dizanî bû ko bi mêrxasiya Gurgîn navê malbata wî , di nav dost û dijminan de, her xwedîrûmet wê bimîne .

Gurgîn , ji her talanî qimaş û qedîfeyân giranbiha , hevrûşimên bihagiran , şûrên qewdzêr û kalanzîv , gerdeniyên mirarîkirî , mehfûr û xalîçeyên çavnedîtî û keç û jinên rûperî dianî mal .

Rojek ji rojan Gurgîn , di şerekî de zora dijminan biri bû . Xelkê Kurdistanê pê şa bû bûn .

Mîr , axa û serekên eşîran , koçer û dêmanî hemî , ji bo serdana wî hatin û di qesra bavê wî de heft roj û heft şev jê re dawet û şahînet danîn . Şeva xelasekê bavê wî ji textê xwe hat xwar , li kurê xwe nêrî û jê re got :

- " Tu kurekî çak î Gurgîn , Xwedê her arîkarê te be , Xwedê çiqas mezin e , di jiyîna min de mêrxasiya te nîşa min da û ez bi çavên xwe ên qerimî dibînim ko navê min û navê malbata min bi te dê her bijî !

Te daye ser bavê xwe .

Xwedeyo ! Ez her evdê te me , te kurekî baş , kurekî bi hiş û bîr , kurekî destvekirî da min .

Gurgîn,de ji min re bibêje , bavê te dixwaze ji te re tiştekî bigerîne diyarî , ka dilê te çi dixwaze ? Her çi ko daxwaza dilê teye, divê jê bigirî !

Dengê bavê wî ne qediha bû , çavên Gurgîn wek stêrên ezmanan çirisîn û wî bi dengekî lerizî got :

- Bavê min , Mîrê min ê mezin , ji min re keça çiyayên Şingarî Perîxanê bide , daxwaza dilê min ew e !

Mîr bihnekê bêdeng ma û xwe kher kir , wî hawara dilê xwe ya bişewat dibihîst . Pişt re , bi dengekî xurt û lez got :

- Wê bibe , piştî belav bûna dawetê bila ji te re be !

Rûyê Gurgîn sor bû , çavên wî ji şahiyê dibiriqîn , ji cihê xwe rabû û ji bavê xwe re got :

- Min zanî te ew da min , bavêmin , Fermandarê min ê mezin , ez xulamê te me . Ez xwîna xwe li ber te de didim , ev xwîn ya te ye , wê dlop , dilop ji canê min bikêşe . Mîr lê vegerand :

- Ez tiştekî na xwazim , ez minêkarî ne tu tiştî me û serî wî ket ser sînga wî .

Piştî saetekê dawet firikî û her du, di tenişta hrv de , bêdeng,diçûn bal aliyê malê ve .

Şev gelek tarî û reş bû . Ewrî qeteke ji ezmanan û rûyê stêran weşarti bû . Bav û kur , di vê tarîtiyê de , dimeşiyan , naxir Mîr Tacîn dest bi axatinê kir û got kurê xwe :

- Roj bi roj jîna min vedimire û dilê min ê pîr hero ; sistir dibe û agirê sînga min her xwe kêm dike , tinê hejkirina Şingariyê xweş bû , , ew bû bû germiya jiyîna min ; Gurgîn ka ji min re bibêje tu gelek jê hez dikî ?

Ji cariyên min , ji cariyên qesrê bi sedan bistîne , tinê bila ew bimîne nik min .

Gurgîn bi dengekî tehl bihna xwe dikişand . Mîr ji nû ve got ê :

Di dinyayê de çend rojên min mane , tenê çend rojên kurt ...rojên bihejmar .

Şahiya dilê min a dawîn Perixan bû , ew min nas dike û dikare sebra xwe bi min bîne . Ji bilî wê kî dikare ji min , ji vî mirovê pîr û ketî hez bike ? Tu kes...kes ji wan .

Gurgîn deyn ne dikir .

- Çawan ez dikarim bijîm û ez bizanim ko tu wê maç dikî. Ko xeberdan ser jinan e , ne bav heye ne jî kur Gurgîn ! Êvara jiyîna min , ji min re , wê gelek dişwar bibe ! Ji min re xweştir dibû ger brînên min ên kevin vebûyan ş xwîna min jê birejiha û min ev şev ne dîta .

Kurê wî dîsa deyn ne dikir , bêdeng dima .
Her du li ber deriyê qesrê rawestan . Her du serên xwe êxistin ber xwe de .
Dormadora wan reş bû , bayekî xurt pencereyên qesrê dihejandin , di serbanan de , di nav şax û çiqlên daran de , straneke kûvî distira .
Gurgîn bi dengekî nerm , ji bavê xwe re , got :
- Bavê min , ez ji mêj ve jê hez dikim .
Bavê wî lê vegerand û got :
- Belê , ez wê dizanim û dizanim jî ko ew hejî te na ke .
Gurgîn got :
Kengê ew tê bîra min , dibînim ko dilê min her pê ve girêdayî ye . Methelokên me xweş in , dibêjin jin ji şerî dişwartir e ko spehî ne dilê biyaniyan dikeve wan , ko kirêt in dilê mêrên wan ezêb dibîne .
Mîr got :
Hikmet û gotinên kûr ne dermanê êşa dilan e . Kurê wî lê vegerand :
- Ma bavê min , daxwaza me , di pêşberê hev de

girîn û gazind e , ma em pê dilnermkirina hev û du digerin ?
Mîr serê xwe yê porspî rakir û bi çavên kovan û keserê li kurê xwe nêrî , kurê wî got :
- Dixwazî em wê bikujin
Mîr , serê xwe hejand û got :
Tu ji ... ji min û ji wê btir hejî nefsa xwe dikî !
- Tu jî . Dîsan her du deyn ne kir , piştî bihnekê
Mîr got :
- Belê , ez jî .
Mîr , ji kul û qehrên vê demê wek zarokekî lê hati bû . Kurê wî ji nû ve pirs kir :
- Çawan dibêjî ...dixwazî em wê bikujin ?

Bavê wî bi dengekî têr zarîn û girînê got :

- Ez ni karim wê bidim te... ji min na yê !!

Kurê wî lê vegerand :

Lê ez jî êdî ni karim bê wê bisekinim , an min bikuje an wê bide min !

Kurik dîsa jê pirs kir :

- Dixwazî em wê bavêjin avê ?

Her du ketin aliyê malê , Perîxan li ser xalî - çeyeke spehî û rengîn raza bû , pêş wê de sekinîn û her du lê nêrîn .

Hêstirên germ ji çavên Mîr diketin ser riha wî ya spî û di ser wê de weçilopên jaleyan dibiriqîn .

Kurê wî bi zor û dişwarî xwe digirt , wî bi dengekî zirav ba kir ê .

Gava Perîxan ji xewê hişyar bû û Mîr dît , lêvên xwe yên sor da wî û jê re got :

"Eyloyê pîr , min maç ke ! "

Mîr dengê xwe nerm kir û bi melûlî got ê :

- Ji cihê xwe rabe , divê tu bi me re bêyî !

Gava Perîxanê ew dîtin pirs çi ye zûka seh kiri, bû ji ber ko ew zêrek û jêhatî bû û tirs çi ye ne dizanî .. û hema got :

- Ez têm , qerara we ev e , ne ji bo te , ne ji bo wî , mêrxas wisan dikin .

Her sê bêdeng bal avê ve diçûn . Ser şîverêke asê û xwehrûvîç , bayî bi dengekî kûvî lib liber xwe dibir . Perîxan nazik bû , zûka westiya , lê çawan ew xirayî bû ne dixwest hevalên wê pê bihesin . Gava Gurgîn dît ko Perîxan bi şûnda dimîne , wî jê re got :

- Tu ditirsî ?

Perîxanê tiştek ne got , bi çavên xwe yên delal lê mêze kir û peyên xwe yên qusayî û bi xwîn nîşa wî dan .

Gurgîn destên xwe drêj kir ê û got :

- Ez ê te hilgirim !

Perîxanê xwe avêt singa Mîr , zendên xwe li stoyê eyloyê xwe werandin . Mîr ew hilanî û li ser zendên xwe wek guhekî sivik ew hilgirt .
Perîxanê bi destên xwe çiqlên daran dida alîkî û rûyê xwe jê vedida .
Gurgîn ji paş ve dihat , ji nişka ve got bavê xwe :
Bihêle ez bikevim pêşiyê , revîna agirê sor dikeve dilê min , ez ditirsim xencerekê li stoyê te bidim .
Mîr got ê :
- Here pêşiyê , bila Xwedê li kêmaniya te me nêre .
Min ji vê gotinê tu efû kirî , hevîn çi ye ez dizanim .
Êdî guşguşa dengê avê dihat . Gava gihan serê zinarekî mezin , di bin re , di reşiya şevê de , ava Şetî wek kortaleke kûr û tarî , ji wan re xuya bû .
Bi dengekî kezebşewat pêln avê kef didan û diherîkîn .
Ev der sar , hov , têrtirs û tomet bû .
Mirin lê digeriya .
Mîr Perîxan maç kir û gotê : " Xwedê bi te re be !
Gurgîn jî xwe di pêşberê wê detewand û got ê : " Xwedê bi te re be !
Perîxanê berê xwe da kortala ko tê de şekên avê strana mirinê distiran . Gava ew ket ber rexê kortalê , laşê wê lerizî û sîngê xwe bi destê xwe givaşt û got : Min bavêjin !
Di dema ko Gurgîn destên xwe drêjî wê dikir û bihna xwe bi dişwarî hildikêşa ; Mîr Perîxan ber sîngê xwe ve hilanî , givaşt , maç kir û ji serê zinarî ew avêt avê de .
Tu deng û axîn jê seh ne kirin .
Ezman reştir û ewr hêj tarîtir dibû . Dengê bayî êdî dengê gor û goristanan bû . Gurgîn ji bavê xwe re got :
- Bavo , de em herin . Mîr hêdî hêdî lê vedigerand : "Bisekine , Mîr bala xwe dida , heçko guhdariya dengekî dikir , lê tu deng ne dihat . Wextek borî kurê wî dîsa got ê : " Bavo , de em herin . Mîr careke din

got ê : " Bihneke din bisekine ; Wextekî din borî
û Mîr got :
- De were em herin . Çend gavan bi hevre çûn , ji
nişka ve , Mîr sekinî û got :
- Ma ez diçim kû ? ! Ma ez ji bona çi diçim ? !
Jiyînamin hemî bi wê re bû , ko ew çû jiyîn û rahetî
ji bo min çi ne , ji çire ne , bi kêrî çi tên . Ez pîr im ,
kes êdî ni kare hejî min bike û jiyîna bê hevîn
ne dînîtî ye ?
Kurê wî lê vegerand :
Bavê min , tu bi nav û dengî, di destê te de girtin û
berdan heye , dewlemendî heye ! Mîr jê re got :
Gurgîn , ji lêvên wê , ji lêvên Perîxanê ramûsanekê bide min
û dewlemendî û navdariya min ji xwe re bibe . Ew tiş-
tên ko te hejmartin , tiştên mirî û bêcan in , bi tenê
hevîn û jin bihndar û rengdar in , kaniya jiyînê jin e .
Yê ko bê hevîn e, bê jiyîn e , perîşan e û rojên wî
bi xem û keser in , bi kovan û hêstir in . Bila Xwedê her
arîkarê te be . Gurgîn , bila şev û rojên te bi tenahî
û xweşî biborin . Mîr ev xeber gotin û dest bi çûyîna aliyê
avê ve kir . Gurgîn qirek da û got :
"Bavo ! " û sekinî bê , tiştekî din , bi ser ve zeyde
kirin jê ne hat . Ji xwe mirovê ko jiyîna wî jê re tehl
bûye û mirin pê dikene û wî gazî ba xwe dike , jê re çi
tê gotin . Bavê wî lê vegerad : " Dev ji min berde ".
Kurê wî got ê : " Û Xwedê ! " Mîr got :
- Ew her tiştî dizane û bilez giha serê zinarî û xwe
avêt avê . Dengê bayî li nav dar û çiyan xurt û
tîj dihat .
Gurgîn berê xwe da ezmanan û gazî kir : " Xwedêyo !! ji
min re jî dilekî xurt bide .
Çavên Mîr Tacîn , di şeva mirinê a tarî de , welê
neqihan .

INSTITUT KURDE DE PARIS
ENTRÉE N° 1138
89
BED